# DENGÊ KURD

2713 k 1-10-2013 z DENGÊ KURD -hjmar (17) www. Pdksp.com


## Rêber û rêberayetî

Rêber û rêberayetî
Rêber û rêberayetî di ferheng û rewşenbîriyakurdî de karîgerîyeke xwey serekî heye li ser jîn û jiyan a milet û tevger a mirov û civakê de ji ber ku rêber û rêberayetî pêwîstî ya xwe heye ji tevger a jiyar û pêşveçûnê re da ku birêvebirin li rêraz û şêwazekî durust û rasteqîne pêşve biçitin bi pêşbînîn û mafkêşan.
Di dîrok û jiyan a miletê kurd de gelek rêber û serkirde peydabûn lê kar û xebat a wan biser neket ji bilî barzaniyê nemir ve ew kesayetiya ku dikarîbû hemû pend û temekariyan wergire bi gulbijêrî ji hemû serbuhêrk û ezmûnên rêber û serdarên pêşî ve û wisa şoreş a eylûlê vêxist û serkeftin bidest ve anî .
Nûka kurd berhemê kar û xebat a wî sûd û serkeftinê jê werdigrin û wa diyare ku rêber û rêberayetî ango kar û xebat liser rêbaz a qurbanîdanê bê beramber.

**Dengê kurd**

# RêBerayetî ya Barzanî Berhemê Qurbanîdanê



2L

## Welatê bav û bapîran bernedin

3L

## Xwendevan û ciwanên kurd

2L

## şoreşa Eylulê Gulgara Kurdayetîyê

3L

## Peymangeha nesredîn li çilaxa

# Şoreşa 11 Eylûlê Sala 1961



Ehmed lewend

sûd wergirtina ji şoreşa 11eylûlê sala1961 ya pîroz, xalaYekemînHişyarkirna hestê netewî li cem miletê kurd ûBehwerya kesê kurd bi kesayetiya wîû bê xwe berdy li ser kesî dî ûZelal bûna mafê gelê kurd ûAvakirina çanda konevanî (siyasî) li nav miletê kurdûRakirina dûvçûna hoziyin kurdyetî(eşîrtî) û dest helata begleryê ûAvakirina peywendiyadi navbera cemawerde û Nêzîkbûna ola ji hev çi êzîdî yan mûhemedî yan xirîstiyanî,hevaltiya di nav bera pêşmerga de li hemîdevera, ûÇandina sîsika berevaniyê di ber xuedeweke kurd ûAvakirina ragihandinek ser bixwe ji kurdare cara yekemîn,û Xûdêdana şoreşeknû ji kurda re,ûTevlî bûna serkirde wek barzanî nemir di hemî şerade, û Rêzgirtin ji cemawerê miletê kurd re û dana mafê jinêû Ber çavkirina Şehadetê û pakrewaniyê kesê pêşmergeûNêzîkbûn jiv fihimkirin di navbera hemî zaravê kurdî de ûPêşmerge bûbûn nîşana kurdewarye ûdîmoqiratyetê û wekheviyê ji hemî kesîre ûŞoreş mabûtenê di daxwza mafê kurda de bankirbû bidîmoqiratye û wekheviyê ji hemî kesîre.





Leyla Sadûn - Dêrik

# Welatê bav û bapîran bernedin



Em di wêbaweriyê de ne,kudema mirovkî kurd û bi taybetî divê demê de biryarakoçberyêdistîne û welatêbav û kalanberdide,hezarkul û derd di dil û canêwî de cihdigirin,ûemdizaninkuîroegerênkoçberiyêpirbûne û tevjîgiran û cih girtî ne. newekgelekmirovdirabin û dirûnin, gotinênpûç û vale dihavêjin, hindibêjinevkoçberîji çavsoriyê ye, hindîdibêjinçavlêkirine û hindîtirdibêjindevji wan bigerinew li jiyanekexweştirdigerin. lêewmirovjibîrdikinyandixwazinjibîrbikinku gerênkoçberiyêjijimarapartiyên me zêdetirbûne û piraniya wan partiyanîroberpirsin di berkoçberiyavîmiletî de û nexasimyênkuîroxwe bi darêzorêkirineserwerêvîmiletî û destênxweli qirikawîpêçane û roj li dûvrojê bi hişkîdişidînin , kedawîdixwin û jiyanawîyarojaneteng û tevlîhevdikin,hêviyênwî bi paşerojekegeş û xweşdi kujin,xewamiletlêherimandine, hiştine her şev Dêwêbirakujiyê di xewnaxwede bibîne .jibilîwêjîkarênqirêjyênbazirganênxwînmij û kedxawr, kuîroketinegolagemara rûreşiyê, xwejibîrkirinekudîrokrehmê li kesînake û rojaazadiyêwênêzîkbê û wê çawa bikarinwîrûyêxweyêreş li pêşberîzarok û jinên kurd sipîbikin .bazirganênşer û cenganyênkuxema wan nobedarîbilindbûn û nimizbûnaDolarî ye,buhayêkel û pelan bi bilindbûnaDolarî re bilindikin , lêdemaDolarnimizdibe her ewdimîninli seryaxwe û buhayêtiştanbilinddikin , nimizkirin di ferhengawijdana wan de wendabûye û miriye, û naxwazinjîtucarîdengêwêjîbibihîzin ??!!. Kanavêmaldarekîkurdji min re bêjin ,kuhemadi cejnaRemezanê deyankudi demekedîde destênalîkariyê da ne belengaz û perîşanênvîmiletî. tiştadixuyêyêdikarê di seryêdîde dişkîne. bixwedêkesî haj kesînîne û her kes bi xweketiye û li peyîberjewendiyênxwedibezin. bigotin û galgalankesnikarê wan û kesxwekêmîkesîjînake, zimanbi xwemeydanekerastebênewal û kaşe û her demîhevalêxwediyêxweye, lêwekdixuyêdi warêkirinê de û li serrûyêerdê her kesdixwaze di serxwe de bikşîne û dibêjexwezî li mino !! Çîroka me wekçîrokaMelê ye, her kesdibêjekabide min ,kesnabêjeperîşanekî ha jitere. Eve rastiyarewşamiletêkurd li Rojavayêkurdistanê,rewşeke bi tirs, wêran û xirabe. vêcahindixwazin bi gotinênxweş û qelewvîmiletî bi xapînin, lêjibîrdikinkubarêmiletgirane û tenê bigotinanbirînênwînayêndermankirin. Rastekoçbarî û bazdanajiwelêtû bi vîrengîû di vêdemanazik de, tiştekîşaşe û bi tipîvanannayêqebûlkirin,lêwek me got mademegerênkoçbariyêhene, divêem li xwevegerin û jixwebipirsin,jiberdemaegerênkoçberiyêrastwerindest nîşankirin, bêgumantengavî û aloziyênkoçberiyêjîwê bi rengekîrastbêneçareserkirin. wektêgotin her derdekdermanekjêreheye.

# Peymangeha nesredîn li çilaxa

Dengê Kurd

Rêveberyapeymangeha pakrewan nesredîn ya li devera çil axa berî niha xulek ya komîta rêxrawî amade kiribû û ji vê xulê me xwest wek devera çil axa û aliyan em van hevalên xwe jin û keçan fêrî xulek dî bikin ji bo pêşerojê karibin kar di rêxistina partî bikin wek endamê leqê û kar li vê deverê bi rêve bibin di nav cemawerê meyê kurdde li van gundên ko em tê de dijîn çi karê konevanî(siyasî) ûçi zanistî yan civakî û bi taybet rêxistinî ev xul hat berdewam kirin 2 heftiyan û rojane bû. di her rojê de simînarek dudem hijmêr û bi navberek kin.ev simînar di hate dan ji layê hevalê andamê leqêve û hin kadirên partî.



Di nav wan simînaran de babetên herî giring hatin dan wek perwerdekirinê û dîroka kurdistanê û dîmoqratîyet û helbijartin û Cîpolîtîka kurdistanê û dîroka tevgera barzan û bi çi şêweyî em kurd bigihên dewleta xwe ya kurdî û babet li ser şêweyê rêxistin di hundirê partî de û li ser rola jina kurd di dîrokê de û di dema nû de û li ser netewa kurd û hizrê netewî û dawya simînaran de li ser ragihndin û rola wê ya giring di nav partî de û piştî demek ne dirêj me ezmûn ji endamê vê xulê re çêkir û ev xul hat derçûn. şehîd rumeta mene bijî kurd.. bijî kurdistan ..bijî rêbazaberzanî Komîta Çand û ragihandinê ya partî nivîsingeha çil axa.alyan

# Peymangeha BEDIRXAN

## Gava Mezin Ji Gava Biçûk di Bişkive

EBAS MÛSA

Piştî du salan ji şoreşa rûmetê li Sûriyayê, dîwarê tirsê şikest, û rejîm ji hinek bajarên kurdî vekişî. Vê vekişandinê gelek tişt diyarkirin û derî fereh li ber pirsan vekir. Gelo ma em dikarin barê azadiya xweş û giran hilgirin?! ger em pirsa siyasî bidin aliyekî û bersivan bi hêlin ji wan re (ji ber em divê mijarê de, di tiştekî din de di xebitin). Jibilî karê siyasî yê ku kolanên kurdî pê mijûldibin, li gel ku yê giring û lezgîn ewe, ji bilî vî karî; karê çand û wêjeyî dixuyê weku pencereyek fereh li ber çand û wêjeya kurdî vebûye, lê ev çand û wêje û jiyana kurdî bi hewceyî xwendevanin bi zimanê kurdî ye. Zimanê kurdî bi dehê salan qedexe bû birengekî dijwar, ta ku axavtina bi kurdî jî qedexe bû di dibistan û deverên fermî de. Dibin qedexekirina bivê zordariyê, zimanê kurdî li berxwedida!. li bajarê kurdî komikên zimanê kurdî fêrî zimên dibûn, û bi dehê ciwanan hînî tîpan dibûn, wiha li zanîngeh û gundan.

Lê ger em bixwazin bi pirsin: ta çiqasî zimanê kurdî li berxweda? Bersiv ewe ku fêrkirina zimên ma di çarçoveya tîpan, an di astê jêrîn di ziman de. Û di ber wê de jî wêje û çandeya kurdî ma bi tenê bê xwendevan, û mabû ku rewşenbîr û nivîskarên kurd ji hevre binivisînin û ji hevre bixwînin.





Bilind mela – Dêrik

# Xwendevan û ciwanên kurd xetîra serkeftinê ne

Li jêr kewdan û baredûxên tengevî yên sûrî têde derbasdibê bi giştî û rojavayê kurdistanê bi taybetî ji şoreşeka ta niha berdewame ya ku bangewaziyî dikê ji bo azadiyê û serbestiyê . Di vî warî de rola genc û xwendevanên kurd li rojava diyar û eşkere bû ku ev texe bû pêşeng û ardûyê şoreşê , li vê derê gotina Barzaniyê nemir tê ziman ( xwendevan serê rimê ne di hemî şoreş û serhildanan de ). Û ewin helgirê xetîra serkeftinê ne û navenda tevgera rêzgarîxwaza kurdî ne .Encama vê yekê xwendevan û ciwanên rojavayê kurdistanê dîtin ku erk û berpirsiyatiya wan yekîtiyek damezrînin , ji ber ku ev texe pêşberkê hemî hevrêz û rêxistina ne û serkirdayetiya cemawer dikin di xwepêşandanan de . lê di serhindêre bê çar man ne karîn berdewamî bikin bi sedema zordarîya rijêma sûrî û gelek kewdanên civakî . Pêngava zîrîn di dîroka rojavayê kurdistanê de berî çend rojan xwendevan û ciwanên kurd li rojavayê kurdistanê yekîtîyek damezrandin li Hewlêrê navenda biryara netewî a kurdî , rekeftî 7/9 /2013z li jêr diruşma ( Bi zanyarî û kar nefşek azad û ayîndeyek geş ).Ev yekîtî hate damezrandin ji bo alîkariya armanc û hêviyên xwendevan û ciwanan ,û ji bo pêkanîna dezgehek xwendekarî û lawanî û karbikê bi şêweyek sivîl û aştîyane û berevaniya vî texî ji metirsiya bira kujî û şerê navxweyî .Ev yekîtî hate damezrandin ji bo rêzlênana van xwendevan û gencan yên ku binyata miletê me ne , û ji ber giringatiya wan û berevaniya wan ji hemî metirsiyan . Yekîtiya xwendevan û ciwanên dîmokartî kurdistanî biryar dan di kongirê damezrandinê de hemî daxwaz û omîdên xwendevan û gencan bi pêkbînin da ku bikarin jîyanek xweş borînin . Ev yekîtî pêngavek dîrokîye di pêvajûya tevgera rêzgarîxwaza rojavayê kurdistanê ji ber ti rêxistin berî wê nehatine çêkirin ku di bin baskêt wê de giropek mezin ji keç û xortan kardikê ji Dêrikê ta Efrînê û gelek deverên dî yên ku kurd têde dijîn mina Heleb û Şam .Ev damezrandina he encamek siruştiye ji rewşek saxlem da ku çemseriya gencên netewî yên xebatkar û xwendevanên ku hêvî omîda wan rahatina arazûyan bi rengek dirust . Encama vê yekê ,yekîtî gazî û bang dikê ji bo: - Wan kesan yên bawerin bi rêbaza kurdayetiyê rêbaza Barzaniyê nemir da ku tevlî vê yekîtiyê bin .

-Xemxûr û xwedan xîretên li ser doza kurdî .

- jin yên ji bo mafê xwe yê rewa xebatbike .

- Wan kesan yên baweriya wan di pêdvîya mayin û xweragir li ser xaka rojavayê kurdistanê heye.

- Wî kesî yê daxwaza xebat û têkoşînê di ke .

www.efrinakurdi.org

# Çima bi Islamê

Bêwar Girpirî




Hezar û çar sed sal bihûrîn
Berî wê jî Kurd Mirov bûn
Xwedî ol û tol bûn , ne nezan bûn
Belê rast û mêr bûn
Ne diz û talanker bûn
Belê xwedî xak û mewdan bûn .
Ji Kurda hebûn pêxember
Di bakirin binavê Xwedayê Ekber...
Wiha, me Kurdan naskir Xweda
Dil û canê xwe bo wî me dida;
Êdî daket ola Islam
Hezar û çar sed sal û bêtir bihûrîn
Di destê mede ala Islam
Mixabin! Misilman li me na nerin
Ne Mirov û ne Misilman
Ew xwe dibînin xwediyê Islam
Me na bînin jî wek Insan
Pêk nayênin gotinên Xwedan
Ger di bêjê:
“ولكل أمةٍ بعثنا نبيا”
Yan jî:
“إن أكرمكم عند ألله اتقاكم”



# Pendên Kurdî

Elî Reşîd

Zêr zane yan zor zane*
Xwîn bi xwînê nayê şûştin xwîn bi avê tête şûştin *
Dinya bi dorê ye ne bi zorê ye*
Lişeran xal û xwarzî li xwarinan mam û birazî *
Heta li mirnê çav li kirinê *
tilîyên xwe bi xencera xwe birî*
xwdî yar be bila şûr dar be *
dinê li dinê çavê gur li bizinê*
keça mîran bi qelenê gavana nayê*
ji mêra nav dimîne ji ga çerim dimîne*



# Keça kurda

Hêvî şêxmûs- qamşlo

Ezim ez keça kurda
Ezim derya êş û derda
Ezim kulîlka her buharê
Li vî welatê winda
..................................
Ezim bilindim wek çiya
Ezim wek pêta ser riya
Hey welatê min ............
Li hêviya azadiyê
Ez li benda xweşiyê
Winda nakim van hêviya
..................
Ezim keçek endezyarim
Ser bilindim ez perwarim
Bi pênûs û sewda xwe
Ez bi dijminê xwe karim
........................
Ezim keçek mamosteme
Çêlîka berzanîme
Hey dijminê xerab
Bi pertûka xwe li pêşya teme
...................................
Ezim qîza kurdistanê
Xwişka pêşmergên serhidanê
Dayka şehîdên rizgariyê
Hevala partiya şêrê cîhanê



www.arsivakurdi.org